Seyran

Remezan Îsma`il Gereguhî

Babe babe babe
Hilo ji xewê rabe
Me bibe seyranê
Evro digel me dabe
* *
Dada dada dada
Bipêje nanî û kada
Tu bo me hazir ke
Hemî corên kada
* *
Rojeke ji yên sahî
Hetav û ronahî
Dê çîne seyranê
Keyine keyif û şahî
* *
Spêde, seet heşte
Me seyran û geşite
Ez wesa yê lême
Dê bêjî beheşte
* *
Dê çîne nav çema
Wekî xelkê hema
Dê stirana bêjîn
Verevînîn xema
* *
Libin çinara rwînîn
Dîmenên can bînîn
Heta dibîte êvar
Dê sebra xo înîn
* *
Çîne serêt mila
Bêhn keyin sorgula
Guh deyne xwandina
Şalwîl û bilibla
* *
Paşî zivirrîneve
Berî bibît şeve
Ewa min divêtin
Bo min biken: Eve